# Daxuyanîyeke Hevbeş: Ber bi Sezakirin û Dadmendîya ku rê li ber bêcezakirinê li Sûrîyayê digire

Em rêxistinên jêrîmzeker pêşwazîyê li biryara dadgehên Fransiz a derxistina rayeyên binçavkriinê der heqê sê efserên pilebilind ên ewlekarîyê Sûrîyayê de(Serleşker Elî Memlûk birêveberê Ofîsa Ewlekarîya Niştîmanî a Sûrîyayî, Serleşker Cemîl Elhesen birêveberê Saloxgerîya Sûrîyayî û Serleşker Ebdiselam Fecir Mehmûd birêveberê beşê lêpirsînan li Saloxgerîya Ezmanî) dikin, her weha ji civaka navdewletî dixwazin ku piştgirîya destpêşxerîyên Fransa û Almanyayê bike da ku qurbanî û/an niwênerên wan ên qanûnî karibin bigihên dadmendîyê û tawanker werin sezakirin li gel piştgirîya hemû xebatên destpêka pêvajoya sezakirinê bi serpereştî û garantîyeke navdewletî da ku bibe bingeha aştîyeke domdar.

]anûstendinan û pêvajoya siyasî li Cinêvê nikarin bibin bingeha aştîyeke domdar li Sûrîyayê bê pêvajoyeke sezakirinê a rast dest pê bike û çarenûsa windayan diyar bibe. Ji lew re divabe sezakirin û diyarkirina çarenûsa winda û girtîyên li Sûrîyayê beşekî danûstendinan be. Em dibînin ku erkê me û hemû dewlet û miletên ku bi mafên mirovan bawer in ew e ku em alîkar bin da ku qurbanî bigihên dadmendîyê û bê ceza di tawanên cengê û yên dijî mirovahîyê de li Sûrîyayê nemînin.

Em encamên hevkarîya malbatên qurbanîyan û rêxistinên mafnas ên Sûrîyayî û navdeweletî li gel dadgehên niştîmanî yên Fransî û Almanî dibînin, ku derxistina rayeyên binçavkirinê yên navdewletî li dijî hejmareke kesayetên pilebilind de encama wan bû, her weha em rêxistinên jêrîmzeker bawerîya xwe bi pêkanîna dadmendîyê teqez dikin û amadekarîya xwe bo kar û hevkarîya li gel rêxistinên navdewletî, navxweyî û dadgehên li seranserî cîhanê bo bibelgekirina binpêkirinan û çêkirina dosyayan nîşan didin, da ku di encamê de bigihên mafên qurbanîyan û tawanker jî werin sezakirin.

Ji vê derê, em îroj –ji her demê bêhtir- teqezîyê li ser giringîya van xalan dikin:

- Vekirina rê bo dadgehkirinê li dewletên sêyem bo qurbanîyên tawanên li Sûrîyayê û/an niwênerên wan ew jî bi rêya pêvajoyeke bêalî;
- Piştgirîya alîyên pispor bi lêpirsînan di tawanên navdewletî de û hêsankirina gihaştina Sûrîyayîyên li dewletên din bo dadgehên dewletên dadgehkirinê, weke dîdevan û weke qurbanî jî;
- Piştgirîya xebatên bibelgekirina tawanan û hildana dozan li gel grûpên qurbanîyan bo dijatîya bêcezakirinê;
- Piştgirîya destpêşxerîyên qurbanîyan û yên civaka yên ku dixwazin bigihênin dadmendîyên bo qurbanîyên tawanên cengê û yên li dijî mirovahîyê li Sûrîyayê;
- Piştgirî û garantîkirina karên mîkanîzm, komîte û rêxistinên bêalî û serbixwe, yên navneteweyî û navdewletî bo berdewamîya lêpirsînan û dozvekirina li kesên tawanker li Sûrîyayê ji sala 2011an ve li gor qanûna navdewletî.
- Piştgirîya xebatên li ser asta navdewletî bo destpêka pêvajoya sezakirinên bi awayekî dadmend, zelal û bêalî û bi serpereştî û garantîkirineke navdewletî ku bibe bingeha aştîyeke domdar li Sûrîyayê.

15e Mijdara 2018an

**Rêxistinên îmzeker**

1. Arçîva Sûrîyayî

2. Bedail
3. Berevanîya Sivîl a Sûrîyayî
4. Beytuna Sûrîya
5. Dewletî
6. Dezgeha Besemat ya Geşepêdanê
7. Dezgeha Biratîyê ya Mafên Mirovan
8. Hemwelatînî ya Karê Sivîl
9. Hevgirtina Girtî û Windayê Sêdnayayê
10. Hevgirtina Malbatên Sîzerê
11. Hevgirtina Şemil
12. Hevgirtina Sûrîyayî ya Hemwelatînîyê
13. Hizir û Avakirin
14. Jin Nuha
15. Kampanîya Alîkarîya Yên Din Bikin
16. Kiş melik
17. Klûba Sûrîyayî
18. Komeleya Asoyê ya Dijatîya Tundîya li ser Jinê
19. Komeleya Sûrîyayî-Almanî ya Azad li Hamburgê
20. Komîteya Kurdî ya Mafên Mirovan /Çavdêr
21. Lobîya Femenîst a Sûrîyayî
22. Mena ya Mafên Mirovan
23. Navenda Aştiyê û Civaka Sîvîl
24. Navenda Bibelgekirina Binpêkirinan
25. Navenda Civaka Sivîl û Demokrasîyê
26. Navenda Elkewakîbî ya Dadmendîya Veguhêz û Mafên Mirovan
27. Navenda Kendavê ji bo Mafên Mirovan
28. Navenda Sûrîyayî ya Ragihanfinê û Aadîya Derbirînê
29. Navenda Sûrîyayî ya Serjimar û Lêkolînan
30. Navenda Xwendinên Komara Demokrat
31. Ofîsa Geşepêdana Navxweyî û Piştgirîya Projeyên Piçûk
32. Pêl - Pêlên Sivîl
33. Programa Sûrîyayî ya Bipêşxistina Qanûnî
34. Rewangeha Sûrîyayî ya Mafên Mirovan
35. Rêxistina Bi Dadîyê re
36. Rêxistina Çalakên Sûrîyayî ya Çavdêrîyê
37. Rêxistina Elkewakîbî ya Mafên Mirovan
38. Rêxistina Hawarçûnê a Mirovî
39. Rêxistina mafê mirovan li Sûriyê
40. Roja Din
41. Sûrîyayîyên Rastî û Dadmendîyê
42. Tora Huras
43. Tora Jina Sûrîyayî
44. Tora Sûrîya ya Qanûnî li Holandê
45. Tora Sûrîyayî ya Mafên Mirovan
46. Urnammu
47. Wekhevî